Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1197 | 21-Tebax-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# Di bin şert û mercên herî giran de hunera Kurdî parastin




**Rêvebera Koma Şehîd Sakîne, Gulistan Îbrahîm behsa destpêka avakirina Koma Şehîd Sakîne kir û got: "Di bin şert û mercên herî giran ên rejîmê de me hunera Kurdî parast."**

Koma Şehîd Sakîne di sala 2013'an de li ser navê Sakîne Cansiz a li Parîsê hat qetilkirin, bi awayekê fermî hat avakirin. Beriya ku Şoreşa Rojava di 19'ê Tîrmeha 2012'an de ava bibe, Koma Şehîd Sakîne bi awayekî veşartî kar û xebatên hunerî didan meşandin û bi gelek binbêkirinan re rûbirû diman lê tevî şert û mercên giran hunerê parastin, kar û xebatên xwe dan meşandin. Rêvebera Koma Şehîd Sakîne, Gulistan Îbrahîm Behsa destpêka avakirina Koma Şehîd Sakîne, kar û xebatên ku dane meşandin kir.

### Di bin şertên giran de xebatên hunerî bi awayekî veşartî dan meşandin

Gulistan Îbrahîm behsa destpêka avakirina koma şehîd Sakîne kir û got: "Beriya ku Şoreşa Rojava dest pê bike û mafên jinan were misogerkirin, yekemîn koma jinên Kurd li Rojava koma Şehîd Sakîne bû. Di bin binpêkirinên rejîmê û desthilatdariya wan a li ser herêmên me, nedihiştin em Kurd kar û xebatên xwe bidin meşandin. Me jî weke jinên Koma Şehîd Sakîne bi rengekî veşartî kar û xebatên xwe da meşandin. Di sala 2013'an de piştî şehadeta Şehîd Sakîne Cansiz û destpêkirina Şoreşa Rojava ku jin di her warê de bûn pêşeng û mafên wan hat misogerkirin; Koma Şehîd Sakîne bi rengekî fermî hat eşkerekirin û heta roja me ya îro em kar û xebatên xwe serkeftî didin meşandin."

### 'Eşqa me ya ji hunerê re şaxên xwe veda'

Gulistan Îbrahîm diyar kir ku gelek zehmetiyan dîtine lê piştî Şoreşa Rojava derfetên baş ji wan re hatine afirandin û wiha berdewam kir: "Di destpêkê de gelek zehmetî hebûn, ji ber tirsa rejîmê ya li ser gelê me kes tevlî komê nedibû lê em ranewestiyan û her dem di nava kar de bûn. Di wan rojên zehmet de me rojên perwerdeyên xwe diyar dikirin yan jî me amadehiyên ji bo şahiya 8'ê Adarê û Cejna Nawrozê dikir. Di wê demê de pirsgirêkên amûran pir hebûn nedihatin peydakirin. Gelek kesên ku piştgiriya me kirin hebûn bi moralê wan ê baş dibû wesîle ku eşqa hunera Kurdî di dilê me de bêhtir bibe. Piştî şoreşa Rojava û rizgarkirina herêma me ji destên rejîmê me cihê xwe di navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê de girt û karên hunerê, hîn bêhtir û bi awayekî rasterast da meşandin. Ew eşqa me ya destpêkê her ku çû bêhtir şaxên xwe veda."

### '10 jin cihê xwe di komê de digrin'

Gulistan Îbrahîm da zanîn ku çend stran hatine tomarkirin û amûrên ku bi kar tînin çi ne û wiha pê de çû: "Berî dema ku kom bi awayekî fermî were eşkerekirin me 8 jinan cihê xwe tê de digirt lê bi avakirina şoreşê û bi derbasbûna demê re, niha em 10 jin cihê xwe di komê de digrin. Du jin ji me li tembûrê didin û sê jin li amûrên rîtmê didin. Di komê de ez sê çar cureyên amûrên muzîkî bi kar tînim. Tembûr, amûrên rîtm, bizk û li şahiyên mezin weke Newroz û 8'ê Adarê orgê jî bi kar tînin. Em weke Koma Şehîd Sakîne tevlî hemû şahiyan dibin û bi stranên xwe yên rengîn şahiyan bi coş amededikin. Di hefteyê de du rojan perwerde dibînin ji bo amadekariya çi şahiyan be yan jî ezberkirina stranan be. Bi destpêka avakirina komê re stranek hat qeydkirin ji bo her sê hevalên me yên şehîd Sakîne Cansiz, Fîdan Doxan û Leyla Şaylemez bi alîkariya hinek hevalan gotin û awaz hatin tomarkirin. Strana duyemîn li ser Jîna Emînî hat tomarkirin û gelek stranên din jî hatin tomarkirin."

### 'Bi pêşengiya jinan civak hat rizgarkirin'

Gulistan Îbrahîm bal kişand ser şerê taybet ê ku li ser jinan tê meşandin û teqez kir ku wê her dem têbikoşin heta azadiyê bi ser bixin û wiha bi dawî kir: "Em dibînin ku îro şerê taybet hemû li ser jinan tê meşandin çi di milê siyasî de be çi jî leşkerî û hunerî be. Em dibînin ku pêşengên jin hedef digrin. Em jinên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê her dem em ê têbikoşin, çi bi riya hunerê be çi jî bi riya siyasetê be heta ku em azadiyê misoger bikin. Ji ber ku bi pêşengiya jinan civak hat rizgarkirin. Di dawiyê de ez dixwazim dengê xwe bigihîjînim hemû jinên cîhanê bibêjim ku hunera xwe biparêzin û derfet ji jinên hemû pêkhateyan re hene ku xwe îsbat bikin."

# Ciwanek ji awazên şoreşa Rojava

**Celal Ebdulletîf yek ji awazên şoreşa Rojavayê Kurdistanê ye. Ji 2011'an ve û heta niha bi derbeka xwe tevlî hemî meş, mitîng û merasîman dibe û moral dide.**

Her amûrekî mozîkê xwedî bandoreke cûdaye.Yek ji ciwanên Rojavayê kurdistanê ku ji zaroktiya xwe de ji amûra derbekê hes kiriye û xwe pêş xistiye, Celal Ebduletîf e ku ji destpêka Şoreşa Rojava ve û heta niha, bêyî ku biweste di tevahiya meş, mitîng û merasîman de bi derbeka xwe beşdar bûye û moral daye gel. Herwiha dengê derbeka wî bûye wekî nasnamekê jê re.

Dı debarê jiyan û xebata lêdana amûra derbekê, herwiha bandora wê, Celal Ebdulletîf ji rojnameya me re axivî.




### Jiyana Celal Ebdulletîf

Celala Ebduletîf li ser jiyana xwe ya zarokî axivî û got: "Malbata min ji gundê Girê Pirê ye. Ez di sala 1985`an de li bajarê Qamişlo ji dayik bûme û niha jî li taxa Cûdî dimînim. Min ji zaroktiya xwe de ji mozîkê hez dikir, dema ku ez bi bavê xwe re diçûm dawetan hezkirina mozîkê li cem min zêdetir bû. Ji xwe amûra ku bala min kişand û min xwest ku ez fêrî wê bibim, derbek bû.

Celal Ebduletîf derbarê destpêka lêdana derbekê wiha got: "Ez di 7 saliya xwe de fêrî derbekê bûm. Ez bi xwe fêr bûm û tu kesî min fêrî wê nekir. Dema ku min dest bi derbekê kir, min li şahî û dawetan lêdida. Min bi gelek hunermendan re derbek lêdaye, herwiha bi koma berxwedan re lê daye."

### Heta parçeyek ji destê min hebe ez ê li derbekê bidim

Celal Ebduletîf di dawiya axavtina xwe de wiha got: "Di destpêka rabûna gel li Sûriyê di 2011'an de, min bi tena xwe bafil û derbeka xwe li ser erbeyekê dehfdanê dikirir û min gel li taxa Cûdî ya bajarê Qamişlo kom dikir. Ez rastî işkenceya hikumeta Şamê jî hatim û derbek û bafila min şikandin, lê min dest ji lêdana derbekê bernedа. Bi destpêkirina Şoreşa Rojava re ez tevlî tevahiya çalakiyan bûm û heta niha jî bê westandin ez tevlî dibim. Heta ku parçeyek ji destê min bimîne ez ê ji bo gele xwe li derbikê bidim û bang li hemû ciwanan dikim ku hûner û awazên xwe ve girêday bin."

## Bi kamîreya Birûc Resûl



## FERHENGA BIWÊJAN

**Destê xwe li ber danî:**
- Heqbûna wî qebûl kir; heq dayê; rêz jê re girt.

**Destê xwe jê re danî:**
- Bi heman wateyê.

**Ez li ber te bêçek im:**
- Ez ji bo te rêzdar im; hurmeta min ji te re heye; ez ji gotina te dernakevim.

**Ez li ber te stûxwar im:**
- Ez li ber fermanên te amade me; tu çi bixwazî tu dikarî bi min bikî.

**Gotina te bi şekir be:**
- Dema yek gotina yekî dibire ji bo rêzgirtin hingê jê re dibêje.

**Ji bo xatirê xatiran çû ser dînê gawiran/ji bo xatirê xatiran mirov diçe ser dînê gawiran:**
- Ji bo xatiran mirov berdêlên mezin jî dide.

**Ji bo xatirê xatiran, da barê qantiran:**
- Bi heman wateyê.

**Ji bo xatirê xweyî mirov kevir navêje seyî:**
- Divê mirov xatirê mirovan bizane; divê mirov tiştna bide xatirê hina.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Rêber Apo hêviya azadiya jin û gelan e'

Rîhan Temo diyar kir ku wê tevahiya jinên kurd heya dawiyê tekoşîna xwe dewam bikin û azadiya Rêber Apo a fîzîkî misoger bikin û wiha got: "Rêber Apo hêviya azadiya jin û gelan e."**R-3**



## 'PDK'ê ji dîroka Kurdistanê re rûpelek reş dinivîse'

Ji destpêka avabûna PDK'ê ve û heta niha, ew li dijî hebûn û azadiya gelê kurd ji dijmin re bûye dûvik. Ji bo parastina berjewendiyên xwe ,wê tu carî dest ji xeta xiyanetê bernedaye û li dijî tevgerên kurdî yên azadîxwaz şer kiriye.**R-5**




Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1197 | 21-Tebax-2024 | www.ronahi.net/ku/
Nirx: 500 L.S

# NEXŞERÊYA ÇARESERIYÊ LI ROJHILATA NAVÎN NETEWEYA DEMOKRATÎK E

Ji ber destwerdana hêzên kaptalîzmê û polîtîkayên wan yên li dijî vîna gelan, pirsgirêkên Rojhilata Navîn bûne girêk. Roj bi roj şer, pevçûn û nakokî jî zêde dibin. Ji xwe doz û pirsgirêkên Rojhilata Navîn ji rews û pergala cîhanî bi giştî ne cûda ne, ango pêşketin û geşedanên ku di Rojhialata Navîn de rû didin, teyisandinê li cîhanê jî dike. Li hemberî van pirsgirêkên kûr tenê rêyeke çareseriyê heye, ew jî pergala Netewa Demokratîk e.**R-4**



## 'Aboriya ku bi destê jinê ava bibe, aboriyeke saxlem e'



Berdevka Aboriya Kongra Star a Bakur û Rojhilatê Suriyê Gulê Murad diyar kir ku ew li gorî pêdiviyên civakê tevdigerin û wiha got: "Rêber Apo dibêje ku aboriya bi destê jinê ava bibe, aboriyeke saxlem e, ji ber ku jin xwedî zihniyeteke paqij e û bi pêşketina welatê xwe difikire."**R-2**

## 'Lîstika Kişikê ji bo min jiyan e'



Lîstikvanê şetrencê Ebdilrehman Umer diyar kir ku ew beriya 40 salî bi şetrencê dilîze. Herwiha Umer da zanîn ku Lîstika Kişikê ji bo wî jiyan e û da ku mirov fêrî wê bibe pêwîst e aqilmend, xwedî sebr û vîneke xurt be.**R-6**

## Yûsif Sêvo: Wêje û huner ji bo min ava jiyanê ne



Wêjevan û hunermend Can Yûsif da zanîn ku wêje û huner ji bo wî ava jiyanê ye. Herwiha Yûsif diyar kir ku di warê hunerê de, bi dehan awaz û stran ji komên herêmê û hunermendan re çêkirine û di aliyê wêjeyê de jî çar dîwanên wî li ber çapê ne.**R-7**

Her diçe dengê jinê bilindtir dibe — Nehîr pale — R-2
Yên ku di înkar û pişaftinê de hevkariyê dikin — Zekî Bedran — R-5
Li Bexda û Hewlêrê tevna qirêj — Farûk Sakik — R-5
Divê xweza û hawirdor bê parastin — Rohat Bulut — R-6
Helbest Damezrînerê Şaristaniyê Ye — Kemal Necim — R-7

# 'Aboriya ku bi destê jinê ava bibe, aboriyeke saxlem e'

Berdevka Aboriya Kongra Star ya Bakur û Rojhilatê Suriyê Gulê Murad diyar kir ku ew li gorî pêdiviyên civakê tevdigerin û wiha got: "Rêber Apo dibêje ku aboriya bi destê jinê ava bibe, aboriyeke saxlem e, ji ber ku jin xwedî zihniyeteke paqij e û bi pêşketina welatê xwe difikire."

**Avêsta Menaf /Qamişlo**

Mirov bi rehetî dikare bêje ku rencbêra ewil jin e. Lewma di serdema berê de, mêran bes nêçirvanî û masîvaniyê kirine, kar û barên din tev li ser milê jinan ma ye. Jinan di her qadê de rola xwe pir baş lîstiye, di wextekî nêz de li gundan, şîrdotin û çêkirina berhemên wê di destê jinan de bû, rîs ristin, destar hêrandin, çandin û çinandina bostanan, dîzik çêkirin, tenur çêkirin. Lê piştî şoreşa Rojava ya ku bi şoreşa jinê tê nasîn, êdî jin dixebite û azadiya xwe ya boriyê bi dest xistiye, bi wêrekî dixwaze xwe û zarokên xwe ji mêrê xerab dûr bixe û bi zarokên xwe re jiyaneke aram bijî. Lê ji ber ku mêr jinê weke mal û milkên xwe dibîne, vê yekê napejirîne û nikare qebûl bike.

Derbarêî piroje, kar û xebatên aboriya jin Berdevka Aboriya Kongra Star ya Bakur û Rojhilatê Suriyê Gulê Murad ji Rojnemeya me re axivî.

**Jin di qada aborî de**

Gulê Murad di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Kongreya Star sîwanekî hemû jin dikarin cihê xwe tê de bigrin û karê xwe bidin meşandin. Her wiha gelek komîteyên Kongra Star hene; wekî Akademiyên perwerdehiyê û parestinê. Em jî wekî komîteya Aborî xebatên jin didin meşandin. Ji ber tê zanîn ku beriya şoreş jin di qada Aborî de gelek bê rol mabû hiştin, her wiha ji gelek qadan jî hatibû dûrxistin. Ji ber dewletên destheledar jin dûrî hemû qadan xistibû, mêrê serdest her tişt kirbû bin fermana xwe de û rê nedida ku jin tevlî qada aboriyê bibe. Ger em li dîrokê bi rengekî rast binêrin kesê herî serke yê ku aborî bi rêve dibir jin bû, yanî jin adaleta civakê bi her awayî diparast. Wateya peyva aborî di zimanê yûnanî de ekonomiye, ekonomê tê wateya zagonên birêvebirina malê, ya ku malê bi rêve dibê û pêwîstiyên wê pêk tîne jin e. Gava mirov li dîrokê jî vegere, di civaka xwezayî de jinê mal birêve dibir û çandinî ji cem wê dest pê kir, piştî çandiniyê gava berhem çêdibûn, tişta ku jê zêde diman radikir, da ku pêwîstiyên malbatê bi dest bixe."

**'Piştî şoreşa Rojava careke din jin hêza xwe komî ser hev kir'**

Gulê bal kişand ser hişmendiya zilam ya desthilatdar û wiha pê de çû: "Zilam bi hişmendiya xwe ya desthiladar herdem bi nêçîrê dihizirî û hêza xwe derdixist. Berûvajî vê yekê jin bi malbat û bi derdora xwe difikirî, ji her tiştî hewil dida pêdiviyên xwe pêk bîne wek; ji çermê lawiran cil û berg ji bo xwe û malbata xwe çêdikirin, her wiha berhemên ku bi riya sewalan derdikevin xist di bin xizmeta civakê de. Di dîrokê de kesê herî sereke ya ku debara civakê kirye Jin e, di heman wextî de Jin bû berdevka herî sereke ya civaka xwezayî. Piştî şoreşa Rojava careke din Jin hêza xwe komî ser hev kir û derbasî hemû xebatan bû ku di gelek qadên jiyanî de wekî siyaset, diblomasî û qadê çivakî de lîst. Ji lewra qada Aborî ji bo kesayeta Jin qadeke gelekî girîng bû ku karîbû edaleta civakê bi rêve bibe."

**Sîstema aboriya jin**

Gulê murad di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Di sala 2015`an de bi awayekî fermî komîteya Aborî hate avakirin. Niha di sîstema me ya nû de sîstema hevserokatiyê heye, yanî çiqas zilam evqasî Jin yek bê yê din nabê û herdû hev temam dikin. Niha Aboriya me ya xweser jî heye Jin bi xwe dikare biryar bide û bi xwe komîte-komperatîfa ava bikê, ji bo Jin gaveke gelek mezin e. Niha jî dema ku em diçin serdana malbatan em rastî gelek pirsgrîkên Aboriyê dibin. Pêwîst bû ku Jin bi xwe karê Aborî bi xwe bidê meşandin. Gava yekê dema ku me ji jinan re digot werin em pirojeyan avabikin, yan jî bibin xwedî aborî, neqebûlkirin li cem wan hebû. Ji ber ku ev jin di dema hikûme Şamê de ji mafê aboriyê bê par û bê biryar bû, di bin siya zilam de kar dikir. Herwiha hişmendiya baviksalarî ya ku bi hezarê salan jin di nav malê de hişt, tenê ew wek amûra anîn û xwedîkirina zarokan didît, ev yek bandoreke neyînî lê kiribû."

**Aboriya jin aboriyeke saxlem e**

Gulê murad diyar kir ku kapîtalîzmê bandor li kesayeta jinê kiribû û wiha got: "Rêber Apo anî zima ku aboriya bi destê jinê ava bibe, abûriyeke saxlem e, ji ber ku jin xwedî zihniyeteke paqij e, hertim bi malbat û derdora xwe difikire û pêwîstiyên wan bi çi awayî pêk tîne, bi pêşketina welatê xwe jî difikire.". Aborî bingehê avakirina hemû welataye, bi taybet demên niha de sedema êrişên dewleta Tirk li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo aboriyê ye, herwiha binesaziyên herêmê armanc girtin. Çawa ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê bi Şoreşa jinê tê naskirin, ji ber vê yekê pêwîst bû jin ji aboriyê bê par nemîne. Ji sala 2015'an de heya roja îro em di nav hewildan û lêkolînan de ne, da ku roj bi roj em aboriya jinê xurttir bikin û hijmara pirojeyan zêde bikin."

**'Em ji bo pêdiviyên civakê kar dikin'**

Gûlê da zanîn ku sîstema kapîtalîzimê her dem li gorî berjewendiyê xwe kar dike û civakê hewcedarî xwe dike û wiha do-



mand: "Hemû mijarê ku girêdayî aboriya civakê be xwe li ser dike hêz û bi civakê re şer dike. Ji lewra em li gorî pêdiviyên civakê tevdigerin, ji xwe em wekî Kongra Star ji komînan pêk tên, komîn jî erkê wê yê sereke ewe dinava civakê de be û daxwaziyên wan bi cih bîne. Wekî mînak eger li taxekê pêwîstiya şîniyan bi firinekî hebe bê terdud em ava dikin, ji ber ku ev ji me tê xwestin ku em bi civaka xwe re bibin destek. Civak pirojeyan dide avakirin em jî di hêla maliyê de dibin arîkar. Mînak di her kompertîfekî de mecils heye, di meclisê de jî berdevk heye û em wek komîte jî danûstandin dinava me de hene. Her weha hin pirojeyên me yên cuda jî hebû, em niha dixwazin wan pirojeyên xwe dinava kampeyan de bi cih bikin, da ku gelê me jê sûd bigrê."

**Piroje**

Berdevka Aboriya Kongreya Star ya Bakur û Rojhilatê Suriyê Gulê Murad di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Îsal li herêma Şedadê û Tiltemir gelek bîr hatine kolandin ev jî di astek mezin de bi civakê re bû alîkar, ji vê gavê civak jî gelek kêfxweş û razî bûn. Dîse me pirojeya firneyan daye pêşiya xwe û em bawerin di demek nêz de van pirsgrîkan çareser bikin. Li helebê jî pirojeya sewaldarî me avakir ev gav jî gelek bi me re bû destek, ji xwe her kes dizane ku Heleb di bin rewşeke gelek hesas de ye, di heman demê de di warê çandiniyê de jî li Helebê hin gav hatine avêtin. Ya din jî me pirojeya enerjî dabû pêşiya xwe di astekî de me karî li gorî derfetan em xwe bi rêxistin bikin. Di aliyê perwerdehiyê de jî em dixwazin gelek gavan bavêjin ji ber ku pirsgrîkên hişmendiyê hene, hin kes xwe ayidî Abûrî nabînin, hin kes hene dibêjin ev ne karê me ye karê Rêveberiyê ye. Ji lewra pêwîst e em hemû bi hev re bibin arîkar û xebatên xwe yên Aborî derxin hêza herî bilind."



## Ji Pênûsa Jin

### Her diçe dengê jinê bilindtir dibe

**Nehîr Pale**

Di hemû rewş, şert û mercan de jin berpirsyartî radikin. Mirov dikare vê mijarê bi berferehî şîrove bike. Di gelek şoreş û serhildanên Kurd û ên cîhanî de jin tevlî şerê parastina welatên xwe bûne. Lê kesên dîrok nivîsandin li xwe mûkir nedihatin ku jin ew qasî xwe dane ber berpirsyartiya parastin û rizgarkirina welatên xwe. Niha jî jin berpirsyartiyeke mezin rakirine û ji bo doza xwe ya netewî di girtîgehên Tirkiyê û Îranê de ne. Heyanî ku ji destê Tirkiyê tê bi rêbazên xwe yên qirêj dixwaze îradeya jinên siyasetmedar û şoreşger bişkîn e. Gelek dayîkên ku temenê wan 70 salî derbas dike, niha di girtîgehên Tirkiyê de ne.

Li Îranê, Afxanistan, Hindistan û hwd. ji aliyê hişmendî, piskolojîk û fîzîkî ve êrîşên giran li ser jinê têne kirin. Tê gotin ku dewleta Îranê ev bûye 45 sal li ser jinan zext zêde kiriye. Herî zêde li girtîgehan zext li jinan tê kirin. Hukmê darvekirinê yê ku daye rojnamevanên jin Bexşan Ezîzî û Şerîfe Mihemedî yek ji rêbazên zextê yên herî qirêj in. Li Hindistanê jî bijîjka jin ku temenê wê 31 salî bû piştî ku tê tecawiz kirin wê qetil dikin. Li Hindistanê ji bo kuştina bijîjka jin bi komî gel û bi taybet bi deh hezaran jin daketin kolanan. Yek ji jinên beşdarvan dibêje:` Çêlek û bizin ji me girîngtir in`, ev gotin nêzîkatiyên çewt ên ji jin re têne kirin, tîne bîra mirov.

Li beramberî van êrîşên li ser jina têkoşînvan jinên her tim daxwaza xwe ya azadiyê dikin. Di her gaveke ku jin bi pêşve biçe gelek bedelên mezin dide. Tu carî xwe nedaye paş û her tim berpirsyartî rakiriye.

Di vê peregrafê de mirov dikare bipirse gelo eger jin ji bo azadiya xwe bikin, wê rewşa wan were guhertin an jî wê ev yek ezezî were dîtin? Piştî qetilkirina Jîna Emînî ji aliyê polîsên exlaqî yên Îranê ve jin bang dikin (Jin, Jiyan, Azadî). Ev yek dide îfade kirin êdî jin wê ji bo azadiya xwe dest bidin hev û têbikoşin.

Zîhniyeta cinsiyetparêz her tim jin fêrkirine ku ji bo mêr, ji bo malbata xwe û ji bo zarokên xwe bijî. Jin heyanî ku saxbe wê ji bo xizmetkirina çend kesên derdora xwe saxbe. Li gorî ol li axîretê jî wê dîse jin xizmeta mêr bike. Ev navê wê ne fedakarî û ne jî berxwedanî û ne jî têkoşîne. Wê nikaribe xwe biparêze jî, ev di koletiyê de fetsandin e. Ji xwe civak tu carî xebatên jinê, pîroz nabîne. Hemû westandina jin a fikrî û fîzîkî bêwate dike û li gel wan bêqîmet û bê nirx e.

Bi komî derketina jinan a serhildanan û daxwaza azadiya xwe kirin rengekî nû yê têkoşîna jinê ye. Tûndiya mêr a li ser jinê ji bo bi dawî bibe êdî pêdivî bi rêbazên nû heye. Jin çiqasî bibin yek wê hîn bêtir dengê xwe bighînin tevahî cîhanê û bighêjin mafê xwe. Êdî ji hemû jinan tê xwestin ku bi rengekî baş têbighêjin ku dawiya koletiyê mirineke bê rûmet e.



# Yûsif Sêvo: Wêje û huner ji bo min ava jiyanê ne

Wêjevan û hunermend Can Yûsif da zanîn ku wêje û huner ji bo wî ava jiyanê ye. Her wiha Yûsif diyar kir ku di warê hunerê de, bi dehan awaz û stran ji komên herêmê û hunermendan re çêkirine û di aliyê wêjeyê de jî çar dîwanên wî li ber çapê ne.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Baxê çand, wêje û hunera kurdî baxekî bi wêjevan, nivîskar û hunermendên xwe rengîn e, her yek ji wan kesayetan bi ramanên xwe gul û darên berhemdar in. Ji wan kesan jî nivîskar û hunermend Yûsif Sêvo ye, têkildarî jiyan, kar û xebata xwe ya hunerî û wêjeyî, bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn jî wiha bû:

**Kurtejiyana xwe vedibêje…**

Nav û paşnavê min Yûsif Hacî Sêvo, bi navê (Bavê Ceger) tême naskirin. Navê min ê hunerî û torevanî Diljan Cûdî û Can Yûsif e Di 2'yê Cotmeha sala 1968'an de li gundê Girê Şêra yê girêdayî Dêrkê li Rojavayê Kurdistanê ji dê û bavên Kurd (Hacî û Sînem) hatime dinyayê. Di nava malbateke kurdperwer a welatparêz de, bi ruhê berxwedaniya neteweyî û bi hesreta azadiyê mezin bûme, ku tiştên xwe yên herî giranbuha û bi dehan ciwan û keçên xwe yên hêja û bi qîmet feda kir û şehîd dan di rêya rizgariya Kurdistanê de. Min dibistana seretayî li gundê xwe (Girê Şêra) û dibistana navîn û amadeyî li dibistana Yûsif El-Azme li Dêrikê xwend û piştre min li zanîngeha Helebê xwendina xwe ya bilind beşê hişbirin û lênêrînê li peymangeha tenduristiyê dawî kir. Her wiha min du salan di pileya yekemîn de, li ser asta Sûriyê bawernameya xwe wergirt, ji min re bûrsek ji derveyî Sûriyê derket ku ji bo xwendina kulîjeya bijîşkî û doktora li ser hesabê dewletê li yek ji komarên Yekîtiya Sovyetê bixwînim. Lê mixabin rejîma Sûriyê û rêveberiya giştî ya Nûneratiyên Derve ya Xwendekarên Zanîngehan rê li ber min girtin û red kirin. Ji ber kar û xebatên min yên neteweyî û çalakiyên siyasî di nav xwendekaran û girseya gel de, lewma ji hemû kar û erkên tenduristiyê, ez mehrûm kirim. Di heman demê de ji ber fikir, raman û nivîsên xwe çend caran ji hêla istixbaratên rêjîma Sûriyê ya wê demê ve hatime girtin û binçavkirin û zindanî bûme û bi dehê caran ez hatime vexwendin ji hêla şaxên ewlekariya Sûriyê li bajarê Hesekê û Qamişlo ji ber çalakiyên xwe yên partîzanî (hizbî) û niştimanî,van hemû zextên wan, îradeya min, vîyana min û baweriya min bi doza min neşikand û nekarîn min ji bîr û baweriyên min dûr bixin, ez li ser rêya şehîdan domdar mam û pabendî pirensîpên xwe yên hizbî û niştimanî bûm. Min di gel xwndina xwe xebatên konevanî û çalakiyên torevanî û hunerî jî didan meşandin heta destpêka buhara gelan. Di destpêka Şoreşa Rojava de û di hilbijartinên Meclîsa Gel a Rojavayê Kurdistanê ya di 16'ê Berfanbara sala 2011'an de ez weke endamê dîwana serokatiya Meclîsa Gel a Rojavayê Kurdistanê hatim hilbijartin heta 2014'an. Di dema avakirina Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a herêma Cizîrê de, di 16'ê Berfanbara 2014'an de ji bo heyama 5 salan heta sala 2019'an weke serokatiya hevbeş ya Eyaleta Dêrikê hatim hilbijartin. Piştî wê ez du salan weke hevserokê rêxistina Partiya Yekîtiya Demokratîk a herêma Dêrikê hatim hilbijartin û piştî wê jî di sala 2021'an de tevlî Meclîsa Zagonsaz a herêma Cizîrê bûm û heta niha jî xebatên xwe berdewam dikim.

**Wêje û huner ji bo te tên çi wate yê, her wiha bandora van herdû qadan heyanî çi astê li ser jiyana te heye?**

Wêje û huner ji bo min tên wateya ava jiyanê, tên wateya elend û tîrêja beyanê her wiha tên henas û hestên viyanê, tên wateya jana dil, pestîna hest û rewan. Bandora wan herdû qadan pir mezin bûn li ser jiyan û hebûna min. Ji bo min wêje û huner ne tenê gotinên ku derbas dibin, ew ji bo min cîhaneke ku têde hest û derbirînên xwe vedibêjim, xewn û xeyalên xwe tê de dibînim. Huner ji bo min amûreke handanê ye derd û kulên xwe pê vedihûnim, ew enerjiya hêviyê ye ji bo min, pê azar û daxwazên gelê xwe vedibêjim, bi rêya wan dixwazim şevên tarî bi tîp û gotinên xwe ronahî bikim, peyvên xwe bikim çiraxek riya azadîyê ji nifşan re ronahî bikim û helbest û awazên xwe bikim gurzegul û li ser gora her şehîdekî bi cih bikin. Ji ber heskirina min ji wêje û hunerê re min 26 sal ji buhara temenê xwe bi eşq û evîn terxan kir ji karên nivîsandina helbest, wêje û hunerê.

**Te kengî dest bi karê nivîsîn û hunerê kiriye û di bin bandora çi û kê de?**

Min di sala 1986'an de dest bikarê nivîsîn û hunerê kiriye, ev yek jî di bin bandora şehîd û şoreşgerên tevgera rizgarîxwaza Kurdistanê de. Piştî qedandina xwendina xwe ya zanîngehê û qedexekirina min ji aliyê hêzên ewlekariya Sûriyê ve ji kar û erkên tenduristiyê, min di sala 1989'an de xwe terxan kir ji bo birêvebirina xebat û çalakiyên hunerî û çandî yên herêmê bikim. Ez yek ji damezrînerên Koma Cûdî Dêrikê ku di sala1987'an de û Koma Wanê li herêma koçeran ku di sala 1990'î de hatî damezrandin û yek ji damezrînerên hunergehê bûm di sala 1991'ê de li Helebê. Di sala 2005'an de ez wek nûnerê çand û hunerê li ser asta kantona Cizîrê hatim hilbijartin. Ez li herêma Dêrikê di 26 cejnên Newrozan de wek rêvever, stranbêj, sazvan, şanoger, awazvan û pêşkêşvan, beşdarî bûme. Her wiha min pêşkêşvaniya bi sedan merasîmên şehîdan û ahengên netewî li ser asta herêma Cizîrê kiriye. Ji milê wêjeyî ve jî, min hemû cureyên helbesta kurdî ya kilasîk nivîsandiye, ji kela dilê xwe û bi hest û rewanê xwe yê neteweyî bi sedan helbestên niştimanî, welatperwerî û evînî min rêsaye û vehûnandiye. Hem jî bi dehan helbestên min di kovar û rojnameyên kurdî de hatine weşandin. Li kêleka helbesta kurdî ya kilasîk min helbesta nûjen, kurteçîrok, skêtş, kurteşano, bîrhatin û gotarên civakî û wêjeyî jî nivîsandine. Weke din min gelek lêkolîn li ser ziman, wêje, çand û kelepûra kurdî çêkirine. Di heman demê de helbest û nivîsên helbestvanên kurd yên mîna Melayê Cizîrî, Cegerxwîn û Seydayê Tîrêj û stranên Koma Berxwedan û Şivan Perwer û stranên folklora kurdî bandoreke herî mezin li ser min kirine.

**Armanca te ji lêkolînkirina jiyana hunermend û nivîskaran çi ye û te kengî dest bi vê yekê kiriye?**

Di destpêka sala 2023'an de min dest bi vê pirojê kiriye û min li ser gelek helbestvan û hunermendên kurd ên navdar bi navê Çiraxên Huner û Wêjeya Kurdî bi zimanên erebî û kurdî pirtûkek nivîsandiye. Mebesta min ji van nivîsan ronîkirina kurtejiyana kesayetiyên hunerî û wêjeyî yên afirîner e ku bi pênûsên xwe yên zêrîn û tîpên xwe yên xweşik xizmeta gelê xwe û doza wî kirine û bi stranên xwe yên hêja, bi dengên xwe yên xweş û awazên xwe yên şêrîn pirtûkxaneya hunerî û çandî ya Kurdî dewlemend kirine. Ji bo ku ez bikaribim piçekî ji qencî û fedekariya wan vegerînim û wan teşwîq bikim. Her wiha ji bo berdewamiya çalakiyên wan û babetên ku min di weşanên xwe yên girêdayî jînenîgariya wan û çalakiyên wan ên hunerî û wêjeyî de behs kiriye, tenê dilopek ji kaniya wan ya efrîneriyê û ez ê berdewam bim di vê projeya xwe ya wêjeyî de ku li ser her bîst û yek çiraxên huner û wêjeya kurdî pirtûkekî biweşînim bi herdû zimanên kurdî û erebî.

**Zehmetiyên ku derdikevin pêşiya lêkolînkirina jiyana wan kesayetên çi ye?**

Zehmetiyên ku derdikevin pêşiya min ji bo lêkolînkirina jiyana wan kesayetên afirîner yek jê peydakirina agahiyên hunerî û wêjeyî li ser jiyana wan e, ya dumem jî hin ji wan pir caran ez têkiliyan bi wan re dikim heta ku hin agahiyan didin min astengî derdikevin pêşiya min. Ya siyem hin jê vê projê, piçûk dibînin û ya çaremîn bi taybet kesên çûyîn ser dilovaniya xwe, malbatên wan tu agahiya ser wan nizanin.

**Çend berhemên te yên hunerî û nivîskariyê hene?**



Çar dîwan ji helbestên kurdî hene tev li ber çapê ne. yek jê bi navê Evîna Welat e, ew jî ji 50 helbestên kilasîkî pêk tê. Berhemeke din bi navê Sîval e, ew 40 helbestên kilasîk û nûjen dihewîne nava xwe. Dîwanek bi navnîşana Qend û Pend jî heye, ew jî çend helbestên çîrokî dihewîne nava xwe. Dîwaneke din jî bi nasnavê Can û Rewan heye û 50 helbestên kilasîk hildigire nava rûpelên xwe. Her wiha pirtûkek li ser jiyana hunermend û helbestvanên kurd, bi navê Çiraxên huner û wêjeya kurdî, bi erebî û kurdî heye. Pirtûkek min ya din li ser bajarên Rojhilatê Kurdistanê bi erebî û kurdî heye. Di heman demê de min pirtûkek ji kurteçîrokan bi zimanên kurdî û erebî derxistiye. Her wisa pirtûkek di derbarê wergerandina Dîwana Helbestê ya Melayê Cezîrî ji tîpên Erebî bo tîpên latînî yên kurdî. Mixabin heta niha yek ji wan nehatine çapkirin, hemû li ber çapê ne. Min di sala 1990'î de ji koma Agirî ya Helebê re şanoyek bi navê Pez û Gur nivîsand û ji bo komên gelêrî û hunerî gelek nivîsên şanoyê nivîsandin. Şanoya "Eşqa mezin" ji bo koma Cûdî min nivîsand û gelek Skêç ji bo şanoger Bavê Elî nivîsandine. Kasêtek ji awaz û gotinê min û sitranên filiklorî û kevneşopî bi dengê min û alîkariya (Hêvî,Şîlan û Diyala) min weşand. Ji helbestên min yên ku bûne sitran û girûpên hunermendên Cizîrê sitrandine ev in: Ey Rojava, Dêrik bûka bajara, Ey şehîd û Şehîd Xebat. Her wiha min bi dehan awaz û stran ji komên herêmê û hunermendan re çêkirine mîna Cemal Sadûn, Bavê Hêco, Ciwan Sebrî, Dilo Doxan, Bengî Agirî, Nûhad Yûsif, Hesen Dêrikî,Bengîn Neso, Hejal Elanê, Koma Cûdî- Koma Wanê ,Koma Evîn- Dêrik, Koma Agirî-Heleb, Koma Botan- Kobanê, Koma Engîzek- Efrîn û hwd... .

Di heman demê de gelek helbest û nivîsên min ji ber pêwîstiya ewlehiyê di warên wêjeya kurdî û rojnameyên wekî Dengê Kurdistanê, Rewşen, Torevan, Doza Karker,Ronahî, Sor Gul û malpêran de bi navên veşartî de hatine weşandin. Min gelek bawernameyên pesindan û afirînerî ji malpêr û dezgehên hunerî wergirtine. Wekî din jî ez niha endamê Hevgirtna Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê, HRRK'ê me û hem jî endamê Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê me.

## Têbînî



### Helbest Damezrînerê Şaristaniyê Ye

**Kemal Necim**

Ji bilî rave û danasînên akademîk ên derbarê helbestê, bê ka helbest çi ye, dîroka wê û naveroka wê û rola wê di şaristaniya mirovahiyê de çi ye. Ji bilî van hemûyan hin bîr û boçûn di nava beşekî zanyaran de heye dibêjê helbest li hemû cîhanê damezrînerê şaristaniyê ye. Li gorî wan zanyaran, ziman wekî deng û îşaretan dest pê kir û piştre jî bû amûrê axaftinê, ji bo ku mirov xwezaya xwe û hawîrdora derve nas bike, û bi axiftina mecazî bi şêwazên helbestî yên cihêreng bi xwezayê re bipeyive, lewma mirovên berê di şîn û şahiyan de û dema bobelatên mezin de xwe spartine helbestan.

Di vê mijarê de behsa hin mînakên şaristaniya mirovahiyê tê kirin, mîna nivîsîn Sumerî yên kevnar ên ku tê de mirov bi awayên helbestî şînê dikin, beramber bobelatên xwezayî yên ku hatine serê wan. Her wiha helbestên pîramîdan li Misira kevnar, behsa meznahiya xwedayên Misrê dikin û nemiriya wan di jiyanê de bi rêya helbestan diparêzin. Piştî wê serdemê jî olên cûrbecûr ku derketin bi helbest, û lavij û axaftinên helbestî yên efsûnî banodorê li bwermendan dikin. Bi vî awayî tê gotin ku ti şaristanî ranebûne bêyî ku pareke mezin a helbestan tê de hebe.

Yek ji zanyarên ku pêşî behsa boçûneke wiha kiriye, civaknasê navdar Îbn Xeldûn bû. Piştî wî Ramanbîrê Îtalî Giambattista Vico di sedsala 17`an de di pêşgotina wî ya mezin de li ser "Zanistên Nû" behsa vê mijarê kiriye.

Piştî vê demê, boçûna ku helbest damezrînerê şaristaniyan e di nivîsên Martin Heidegger de derket Heidegger dibêje ku helbest tişên bê liv bi lêv dike û wan dilivîne, helbestvan jî dibe afirînerê cîhanên zimanî û eger ew hêza veşartî û piralî ya di xeyala helbestvanan de nebûna dê pir şaristanî peyda nebûba. Heidegger dibêje: "Helbest çavkanî û bingeha ziman, huner, dîrok, hebûn, dem û heqîqetê ye, kaniya yekemîn e, tiştek li derveyî helbestê tune ye.

Li gorî van boçûnan, bi qasî nirxê helbestê ewqas jî nirxê helbestvan heye. Lewma pir girîng e ku eger kesek bi danîna helbestan mijûl bibe, haya wî ji vê nirxê hebe. Ango bila bi danîn û nivîsên kêm û qels, vê hêjabûna helbestê kêm û qels û bê nirx neke, her wiha bila di nava civakê de nirxê dahênerên helbestan nizim neke.

Di rewşa heyî de li nav kurdan hilbirîneke pir geş a helbestê çêdibe, lê ne hemû berhemên vê hilbirînê mirov dikare bêje ku helbest in. Pêşketina medyaya civakî derfetên weşanê jî mezin kirine, êdî her kes dikare peyvan rêz bike û xwe weke helbestvan bide nasîn. Dîse çalakiyên bêserûber û bê bijartin jî ku têne lidarxistin rê li pêşiya berzbûna nimûne û ezmûnên qels vedike, carna dibe sedem ku xwêner û civak berê xwe ji helbestê bidin alî. Her wiha yên xwêner jî eger li şevbêrkekê, yan di kovarekê yan li ser televizyonekê pêrgî helbesteke bê nirx û bêwate hat, pêwîst e helwesta xwe li ser wê ava neke. Pêwîste her zanibe ku di pêvajoyên dirêj ên dîrokê de helbest damezrînerê şaristaniya mirovahiyê ye.

# ‘Lîstika Kişikê ji bo min jiyan e’

Lîstikvan şetrencê Ebdilrehman Umer diyar kir ku ew beriya 40 salî bi şetrencê dilîze. Herwiha Umer da zanîn ku Lîstika Kişikê ji bo wî jiyan e û da ku mirov fêrî wê bibe pêwîst e aqilmend, xwedî sebr û vîneke xurt be.

**Reşo Mihemed /Qamişlo**

Ew lîstikeke werzîşî ye ku li ser tabloyeke ji 64 çargoşeyên reş û spî pêk tê, tê lîstin. Du lîstikvan li dijî hev bi kişikê dilîzin û her yek ji wan lîstikvanan 16 parçe hene, 8 leşker, 2 keleh, 2 hesp, 2 fîl, wezîrek an jî padîşaheke jin û padîşahekî mêr.

Her lîstikvanek perçeyên lîstikvanê din kontrol dike. Armanca lîstikê ew e ku padîşah bixe xefikê da ku ew nikaribe bireve, ji ber vê yekê lîstik di wê xalê de bi dawî dibe. Ew lîstikeke girêdayî hişmendî û pendeweriya xurt e û pêwîste lîstikvan pilanên stratîjîk bi kar bîne ji bo ku bi ser bikeve.

Lîstika Kişikê kevnar e, dîrok û kesê ku kişik saz û çêkiriye tam nayê zanîn, lê piraniya lêkolînên dîrokî dibêjin ku bingeha derketina Şrtrencê ji Hindê derketiye û belavîcîhanê bûye. Di heman demê de jî bi dirêjahiya dîrokê heya roja îro Kişik hem bi teşe û hem jî bi awayê bikaranîna wê hatiye guhertin.

Li ser asta cîhanê bi hezaran lîstikvanên Şetrencê hene û şampiyonên mezin yên navnetewî çêdibin. Li Rojavayê Kurdistanê lîstikvanên Şetrencê tên peydakirin û şampiyonên lîstkê tên lidarxistin. Ji wan lîstikvanên kêmpeyda Ebdilrehman Umer e. Lîstikvan Umer di derbarê jiyana xwe û lîstkvaniya Şetrencê de ji rojnameya me re axivî.



### Jiyana Ebdilrehman Umer

Ebdilrehman di derbarê jiyana xwe de ji rojnameya Ronahî re axaivî û wiha anî ser ziman: “Ez Ebdilrehman Mihemed Umer im, welatiyekî kurd ji Amûdê me. Di sala 1961’ê de li gundê Sêmtik yê ku dikeve rojhilatê Amûdê ji dayîk bûme. Ez heya temenê 13 salî li gund jiyame, bi lîstikên kevnar yên gundan bi hevalên xwe re dilîstim. Herwiha min karê çandinî, nêçîrvanî û hwd… dikir, hem jî min gelekî ji xwendinê hez dikir. Min li dibistana gundê Sêmtika Jêrîn qonaxa seretayî xwendiye. Piştî ku me di sala 1974’an de mala xwe veguhest Amûdê, ez çûm dibistana Ebî Elaa Elmeerî a navîn û amadeyî û min xwendina xwe li wê dibistanê domand. Herwiha min di dibistana Ebî Elaa Elmeerî de xwendina xwe ya amadeyî qedandiye. Piştre jî ez çûm Hesekê û Peymangeha Amadekirina Mamosteyan xwend û di sala 1983’an de ez ji peymangehê derçûm. Di heman demê de ez weke mamosteyekî li gundekî dûr yê ku dikeve başûrê Hesekê de hatim destnîşankirin. Ez salekê weke mamoste li wî gundî hatim bijartin û piştre jî di sala 1984’an min dest bi xizmeta leşkerî ya rejîma Beisê kir. ”

### Fêrbûna Umer ji Kişikê re

Umer têkildarî fêrbûna xwe ji lêstka Kişikê re wisa peyvî: “Dema ku min qonaxa xwendinê ya navîn û amadeyî dixwend, pê re jî ez fêrî lîstika Damê bûm, di wê çerxê de ez bi hevalên xew re dilîstin. Herwiha bi riya rojname û kovaran re min lîstika kişikê nas kir, rûpelek taybet di wan rojname û kovaran de hebû, min dikirîn û ez ji wan hîn dibûm. Di sala 1981’ê de carekê birayê min yê mezin ji xizmeta leşkerî ya rêjîma Beisê vegeriya mal, lîstika Kişkê bi xwe re anî. Di wê demê de ew û hevalên xwe li mala me bi hev re dilîstin min jî li wan dinerî. Êdî min jî xwest ez fêrî Şetrencê bibim, lewma birayê min, ez fêr kirim ku çawa ez bilîzim. Piştî ez fêr bûm, di wê demê de birayê min got em bi hev re bilîzin, dema em li dijî hev lîstin min zora wî bir. ”

### Riya lîstikvaniya Kişikê ya dirêj û serketinên Ebdilrehman

Umer di derbarê lîstika xwe û serkeftinên ku di warê lîstka Şetrencê de wiha anî ser ziman: “Dema ku ez çûm xizmetkariya leşkerî, li wir jî ez bi lîstka Şetrencê dilîstim, hevalekî min hebû, me dema xwe ya vala bi Kişikê didomand. Piştî ku min karê leşkerî bi dawî kir, ez vegeriyam Amûdê dîsa bûm mamoste û hem jî bi rehetî derbasî cîhana Şetrencê bûm. Li Amûdê gelek kesên navdar û zane di warê lîstika Kişikê de hebûn ji wan Bozan Berazî, Mihemed Elumerî û hwd… . Di sala 1998’an de li ser daxwaza Bozan Berazî şampiyoneke Kişikê di bin sîwana Yaneya Amûdê de li ser asta Amûdê çêbû, ez di wê şampiyonê de bi ser ketim. Piştî wê jî dîsa şampiyoneke din li Amûdê çêbû, ez asta duyem derketim. Dema min di van şampiyonan de asta yekem û duyem bi dest xist, êdî hanedana min ji fêrbûn û xwepêşxistina lîstika Şetrencê re xurtir bû. Yekem car ku min şampiyonek li ser asta parêzgeha Hesekê ya wê demê bi dest xisti, di sala 2001’ê de bû, ev şampiyon li Şedadê bû û ez yê duyem derketim. Di sala 2004’an de jî li Qamişlo şampiyonek hat çêkirin û min asta duyem bidest xist. Herwiha di sala 2008’an de jî dîsa li Qamişlo şampiyonek çêbû, ew jî li ser asta Hesekê gelek lîstikvan beşdar bûbûn, min asta yekem bi dest xist. Beriya çend salan şampiyonek li ser asta kantonên Bakur û Rojhilatê Sûriyê çêbû, ez û Ibrahîm Şakir,Mihemed Cewê û du hevalên din bi navê kantona Cizîrê beşdar bûn û me asta yekem bi dest xist. Şampiyona dawîn ya ku ez tê de bi ser ketim beriya salekê bû, ev şampiyon li ser asta kantona Cizîrê hat lidarxistin û gelek lîstikvan tevlî bûbûn, ez asta yekem derketim. Îdî min xwe hîn bêtir di warî lîstika Şetrncê de li pêş xist. Niha jî ez di nav Yaneya Berxwedan de me û çi şampiyonên Şetrencê yên ku li herêma me li dar dikevin, tê de beşdar dibim. ”



### Lîstika Şetrencê(Kişik) ji bo wî û girîngiya Kişikê

Lîstikvan Ebdilrehman girêdayî wateya lîstika şetrencê ji bo xwe û girîngiya wê wiha got: “Lîstika Kişikê lîstikeke girêdayî jîrbûna mêjiyê mirov e, divê lîstikvanê Şetrencê aqilmend û xwedî sebr û semax be. Herwiha xwedî girîngiyeke mezin û baş e ji bo mirov, bijîşk û kesên bispor mirovan şîret dikin ku bi vê lîstikê bilîzin. Da ku mirov fêrî Şetrencê bibe jî di destpêkê de divê pirtûkên hînbûna Şetrencê gelekî bixwîne piştre jî di warê piratîkî de pêwîste fêr bibe ku çawa kevirên kişkê bilivîne. Awayê livandina keviran tiştekî herî girîng e, her kevirekî cudatir e ji kevriên din, lewma jî pêwîste lîstikvan bi awayê livandina kevirên Kişikê bispor be. Herwiha di destpêkê de girîng e ku bi alîkariya lîstikvanekî bispor bi Şetrencê bilîze û hem jî xwedî vîneke xurt be. Eger ez li ser xwe biaxivim, dê bînim ser ziman ku min lîstika Şetrencê ji xwe re kir karekî sereke û vîna min ji bo fêrbûna Şetrencê pir xurt bû. Şetrenc ji bo min jiyan e û gelekî jê hez dikim. Lê di dema dawî de ji ber rewşên jiyanî yên zehmet ez hinekî dûrî Şetrencê û şampiyonan ketime. Gelek lîstikvanên weke min hene lê ji ber ku hanedan û alîkariya madî tune, dûrî Kişikê ketin, nexasim ku nirxê xelatên şampiyonên Kişikê pir hindik e. Ev yek dihêle ku hanedan û vîna xurt li cem lîstikvanan çênebe.”

## Xwenasîn



### Divê xweza û hawirdor bê parastin

**Rohat Bulut**

Di roja me ya îro de bajarvanîbûn zirareke mezin dide hawîrdora xwezayî û çandî. Bi taybet jî ev zirarên ku li xwezayê pêş dikevin ên bi destên mirovan rê li ber kerasetên mezin vedikin. Gekek caran felaketên xwezayî yên wekî erdhej, lehî, aşît û hwd. ziyaneke mezin daye civak û mirovahiyê. Bê guman hin keraset hene ku mirov nikare xwe jê bibarêz e. Lê bele mirov dikare pêşî li ziyanên mezin bigir e. Pêşîgirtin jî bê guman kêm zêde di destên mirovan de ye. Yan jî tişta ku dikeve ser milê mirovan heye, ew jî ew e ku pêşxistin û parastina têkiliya sibiyotîk e. Têkiliyên simbiyotîk rewşa jiyana hevpar a ku tê de du zindiyên bi alîkariya hev dijîn e. Ev têkilî di navbera cureyên organîzmayên cuda de jî wek têkiliyeke bi kêrî hev tên tê zanîn. Di navbera zindîwarên di xwezayê de û her weha di navbera mirovan de têkiliyên simbiyotîk jiyanî ye û nebe nabe ye.

Di destpêkê de divê civakeke perwerdekirî û hestiyar pêş bikeve. Li hemberî xwezayê hesasiyetek hebe ku hebûna xwe bi hebûna xwezayê ve bibîn e. Li aliyê din divê komîteyên karesatên xwezayî bi beşdariya odeyên pîşeyî û pisporên têkildar bên berfirehkirin û kar bikin. Lewre jiyana bi xwezayê re pêkan, domdare û pêwîst e ku ev jiyan bê parastin. Lewma jî ya girîng ew e ku divê mirov li hemberî xwezayê bi berpirsyar tev bigere. Ew xwza ye ku zindî ye û xwedî giyan e. Bi qasî fêhmkirin û têrkirina xwezayê mirov dikare ji xwezayê sûdê wer bigre. Mirov çiqasî xwezayê têr bike dê xweza jî ew qasî mirov têr bike. Heke zindîwarên li ser vê xwezayê, bi taybetî jî em mirov li pêşberî xwzayê bi rehim û hezkirî nebin dê xweza rehmê li mirovan neke.

Ji bo wê jî divê komîteyên ku li ser vê mijarê rawest e bên avakirin ku çavdêriyê bikin, xweza û hawîrdorê biparêzin. Bi taybetî jî ji bo hebûna xwe divê hebûna xwezayê biparêzin. Parastina xwezayê di rastiya xwe de parastina hemû zindîwaran e. Naxwe di rewşa heyî de erd û erdnîgariya ku mirov li ser dijî têra kesî nake! Ji ber vê yekê divê çareseriya pirsgirêkên jîngehê bi awayekî herêmî dest pê bike. Qirêjiya jîngehê pirsgirêkek e ku tu sînoran nas nake. Lewma jî hevkariya şaredariyên herêmî, hikûmetên navendî û saziyên navneteweyî ji bo parastin, başkirin û pêşxistina jîngehê ferz e. Ji bo rêveberiyên herêmî pêdivî ye ku xwedan envanterek jîngehê ya berfireh hebe. Ji bo rêvebirin û parastina daristan, ax, hewa, av, zozan, av û çavkaniyên xwezayî û peravan divê li şaredariyan “yekîneyên parastina jîngehê” xurt û jêhatî bên avakirin. Lê vê derê risteke mezin dikeve ser milê rêveberiyên herêmî. Bi rêvebirina herêmên bajarî û gundî hewce dike ku ekosîsteman bi jiyana civakî re binirxîne. Divê rêveberên herêmî têkiliya qada keskahî ya xwezayê bi jiyana mirovan re baş fêm bikin û li gorî wê nêzîkatî û polîtîka pêş bikev e. Hem xweza bê parastin hem jî civak. Yanî qada jiyanê ya civakê divê li gorî xwazayê be. Divê jîngehên wekî gund û bajarên ku tên avakirin li ser bingeha ramana parastina xwezayê be ku ji xwezayê têr bibe. Nexwe dê tune bibe. Ji ber vê yekê parastina xweza û hawirdorê ewqas girîng û pêwîst e.



# ‘Rêber Apo hêviya azadiya jin û gelan e’

Rîhan Temo diyar kir ku wê tevahiya jinên kurd heya dawiyê tekoşîna xwe dewam bikin û azadiya Rêber Apo a fîzîkî mesoger bikin û wiha got: “Rêber Apo hêviya azadiya jin û gelan e.”

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Di 10`ê Cotmeha 2023`an de li qada navneteweyî bi dirûşmeya ‘Ji Abdullah Ocalan re Azadî, ji Pirsgirêka Kurd re Çareseriya Siyasî’ pêngav hatiye destpêkirin. Mirovên çep, sosyalîst, demokrat, azadîxwaz, yên xwedî exlaq û wijdan û saziyên demokratîk pêngavekî bi vî rengî dan destpêkirin û ev yek pir bi wate ji tevahî cîhanê re hat dîtin. Rabûna li dijî tecrîdê di heman demê de tê wateya xwestina çareseriya pirsgirêkan.

Di çarçoveya Pêngava ‘Ji Abdullah Ocalan re Azadî, ji Pirsgirêka Kurd re Çareseriya Siyasî’ Berdevka Komîteya Têkilî û Itîfaqiyên Siyasî yên Netewa Demokiratîk ya Kongra Star Rîhan Temo ji Rojnemeya me re axivî.

### ‘Em dibînin ku hêzeka mezin heya li derdora fikirê Rêber Apo’

Rîhan Temo di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Pêngava azadiya Rêber Apo ya fîzîkî ji dema ku hat ragihandin heya roja îro, her kesekî ku ji bo azadiya Rêber Apo xebat û çalakî dan meşandin wekî jin. Ciwan, zarok, kesên demokirat, rewşenbîr, siysetmedar, hunermend, kesên azadîxwaz, kesên sosiyalîst yên ku ji bo azadiya tekoşînê didin meşandin û keda wan di vê pêngavê de em bi rêzdarî silav dikin. Her wiha em dibînin ku hêzeka mezin heya di derdora fikir û felsefeya Rêber Apo, êdî her kes peşdar dibe û gor wê jî tevdigerin. Bi fermî ji bengava ku bi duruşmeya ‘ji Rêber Apo re Azdaî, ji pirsgirêkên kurd re çareseriya siyasî’ salek derbas dibe, lê beriya pêngavê jî çalakî û xebat ji bo azadiya Rêber Apo ya fîzîkî li her çar parçeyên Kurdistanê û derveyê wê dihat meşandin, her çiqas dewleta tirk a dagirker tecrîd li ser Rêber Apo girantir dike ewqas tekoşîn û berxwedaniya gelê kurd û dostên wê mezintir dibe. Em wekî jin vê pêngava azadiya Rêber Apo ya fîzîkî heya astekî bilind em dikarin baş binerxînin, lê ji bo ku em hîn bihtir vê pêngavê bi encamneame û azadiya Rêber Apo a fîzîkî mesoger bikin, pêwîste em bi awayekî hîn aktîftir tevbigerin û asta tekoşînê bilindtir bikin.”

### Felsefeya Jin, Jiyan, Azadî

Rêhan diyar kir ku fikir û felsefeya Rêber Apo gelek guhertin û veguhertin li cem jinan da avakirin û wiha got: “Em di cîhanekê de jiyan dikin ku dagirtî kirîz, şer, pevçûn ku çareserî di navde winda ye û sîstemên heyê li ber têkçûnê ne, di heman demê de sîstema Netewdelet ya ku cewher, reng û hebûne xwe winda kiriye li hemberî nazadiya mirovan û îradeye wan, her wiha di kirîza heyî de fikir û felsefeya Rêber Apo buye çareserê ji hemû pirsgirêkên Rojhilata Navîn re, ji ber ku tekoşîn û xebatê Rêber Apo di îmraliyê dide meşandin li hemberî van sîsteman, ji ber felsefeya Rêber Apo xwediyê çareseriyê ye, ji lewra dewletên dagirker naxwaze Rêber Apo bi fîzîkî azad bibe, ji ber ku tirsa wa ji fikir û felsefeya Rêber Apo heye. Rêber Apo bi tekoşîn û îdolojiya xwe azadiya jinê bingih girt û wekê lingê bingihîn yê felsefeya xwe dibîne û her tim ji bo azadiya jinê bang dike. Ji ber vê yekê ev sîstemên kirîz di nava xwe de jiyan dikin, her dixwazin tecîdê li ser Rêber Apo girantir bikin, ji ber wekî xeteriyekî li ser xwe dibînin û naxwazin ku jin azad bijî her dixwazin di nava koletiyê bijîn, her wiha di roja me ya îro em dibînin ku felsefeya Jin, Jiyan, Azadî belavî tevahî cîhanê buye û her jinek li ser vê duruşmeyê xwe qazanc dike.”

### Perwerdeya xwendina pirtûkên Rêber Apo

Rîhan Temo di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Di Kongireya Kongra Star a 9`mîn de biryare hate dayîn ku komîteyên ji azadiya Rêber Apo ya fîzîkî were avakirin. Her wiha ev komîta li ser asta navendî de hat avakirin û ji gelek rêxistin û komîte di nav de cih digirin, niha jî di nava kantonan de ev komîta tê avakirin. Armanca avakirina komîteya azadiya Rêber Apo ya fîzîkî ew e ku pilansaziya 2 mihan ji bo kar û xebat û çalakiyên ku ji bo azadiya Rêber Apo were li darxistin ku em karibin bi awayekî xurt û aktîf ev pêngav bi encam be. Di heman wextî de em girîngî didin perwerdeyên li ser felsefeya Rêber Apo da ku hîn zêdetir were fêmkirin û belav bibe, ji ber vê yekê grûbên xwendinê li hemû bajaran hatin vekirin, pirtûkên ku tên xwendin û di heman demê de li ser tên nîqaş kirin, Jin û Malbat, Pariznameyên Rêber Apo, Sosiyalojiya azadiyê ya ku herî zêde kirîzên civakê têde tê nerxandin, kirîza kesayet, kirîza azadiyê, ev pirsgirêkan têda tê nîqaş kirin û di heman wextî de çareseriyê jê re tê dayin.”

### Rêber Apo dibêje;‘şerê li ser jinê tê kirin xetierya herî mezine’

Rîhan balkişand ser çalakiyên ku bi pêşengiya Kongra Star ji bo azadiya Rêber Apo a fîzîkî tê li darxistin û wiha got: “Di nava kar û xebatên me te gelek çalakî tên li darxistin û xebatên sereke yên ku em girîngiyê didinê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ye, ji ber vê yekê gelek meşên girsayî bi pêşengiya Kongra Star hatin li darxistin, ya din jî li ser dijîtal mediya, qenalê



You Tube û Twîter cihên ku gel herî zêde dişopîne bernameyên ku li ser ramanên Rêber Apo û jiyana wê em parvedikin. Ji ber vê yekê tekoşîna ku li Rojavayê Kurdistanê tê meşandin di xezmeta azadiya Rêber Apo a fîzîkî de ye. ji bilî van jî konferans û konvedan ji bo azadiya Rêber Apo tên li darxistin. Em tevahî jin heya dawiyê tekoşîna xwe em ê dewam bikin, ji ber ku Rêber Apo dibêje;‘şerê li ser jinê tê kirin xetierya herî mezine’ li ser vê bingihê em ê asta tekoşînê bilin bikin ku tundî û koletî têkbiçe.”

### mirina zagon û maf

Berdevka Komîteya Têkilî û Itîfaqiyên Siyasî yên Netewa Demokiratîk ya Kongra Star Rîhan Temo di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Di pêngava azadiya Rêber Apo a fîzîkî de, pêwîste têkiliyê me di her aliyê û dervede xurtir bibin, bi taybet di aliyê tendirostiya wî de û bi rêxistinên mafê mirovan re, ji ber ku ev tecîda li ser Rêber Apo tê meşandin û li îmraliyê tê jiyan kirin mirina zagon û mafe.”

# Silêman Ehmed 301 rojin ji aliyê PDK’ê ve hatiye revandin

**Navenda Nûçeyan**

**Rojnamevan û edîtorê ajansa ROJNEWS’ê Silêman Ehmed 301 rojin ji aliyê PDK’ê ve hatiye revandin. Piştî 279 rojan ji revandina Silêman Ehmed, ew ji aliyê PDK’ê ve hate dadgehkirin û 3 sal cezayê girtîgehê lê hat birîn.**

Edîtorê beşa Erebî ya ajansa ROJNEWS’ê Silêman Ehmed roja 1’ê Cotmeha 2023’yan ji bo serdanê çûbû cem malbata xwe ya li Taxa Şêx Meqsud a Helebê. Silêman roja 25’ê Cotmeha 2023’yan dema xwest di deriyê Pêş Xabûr (Sêmalka) re derbasî Başûr bibe, ji aliyê hêzên PDK’ê ve hat revandin û piştî heft mehan parêzeran karîn hevdîtinê li gel de bikin. Rojnamevan Silêman Ehmed 301 rojin di girtîgeha PDK’ê de tê girtin.

Hefteyek piştî windabûna Silêman



Ehmed, asayîşa PDK’ê ya Dihokê di daxuyaniyek tejî berovajîkirin û nerast de got ku qaşo revandina rojnamevan Silêman Ehmed ‘ne ji ber karên wî yên rojnamevaniye’ û bi eşkere gefa cezakirinê li rojnamevan Silêman kirin û îtiraf kirin ku wî revandine.

Herî dawî di bin zextên sivîl yên rojnameger, sendîka û rêxistinên li ser asta herêmî û navnetewî de, roja 22’yê Gulanê destûr hat dayîn ku parêzerên wî li girtîgeha Asayîşa Dihokê hevdîtinê pê re bikin.

Yek ji parêzerên Silêman Ehmed, Beşdar Hesen di derbarê hevdîtina li gel Silêman de agahî da ajansa ROJNEWS’ê û got: “Em bi Silêman Ehmed re li odeyekê rûniştin. Di hevdîtinê de Silêman Ehmed spasiya hemû kesên ku ji bo wî hewl dane kir û silavek taybet ji hemû xebatkarên Ajansa Rojnewsê re şand. Her wiha Silêman Ehmed spasiya hemû rêxistin, sendîka, rojnamevan û welatparêzan kir ku hewl dane wî azad bikin. Em gelek keyfxweşin ku me rewşa tenduristiya wî baş dît, tenê daxwaza wî ew bû ku heta serbest bê berdan zextên heyî berdewam bike.”

Parêzer Beşdar Hesen tekez kir ku niha li gor madeya 1 a yasaya jimare 21 ya sala 2003 ya Parlamentoya Kurdistanê, ku girêdayî ‘têkdana ewlekariya netewî’ ye, zêdetir ji 7 mehane ji aliyê dadwer ve tê ragirtin û got; “Lê belê heta niha tu tomet li ser wî nehatine tesbîtkirin. Me parêznameya wî wergirt û piştre serdana dadwerê Dadgeha Lêkolînê ya Asayîşa Duhokê kir û got deriyê me ji we re wek parêzer vekirî ye.”

### 3 sal ceza lê hat birîn

Herî dawî 3’yê Hezîranê Dadgeha Sûc ya Yek ya Duhokê roja yekê ya rûniştina dadgehê ya Silêman Ehmed weke 30’ê Hezîrana îsal, diyar kir. Lê dadgehê bi hêceta dadwer ne amadeye û asayîşê kel û pelên rojnamevaniyê ne şandiye, danişîn ji bo 29’ê Tîrmehê hatibû taloqkirin. Di 29’ê Tîrmehê de Dadgeha Dihokê 3 sal cezayê girtîgehê li Silêman Ehmed birî.

Derbarê madeya ku Silêman Ehmed pê tê darizandin, parêzerê wî Beşdar Hesen wiha gotibû; “Ew madeya ku muwekîlê me Silêman Ehmed pê tê darizandin, madeya yek ya yasaya hejmar 21 ya sala 2003’yê ya Parlamentoya Herêma Kurdistanê ye ku taybete bi têkdana ewlekariya Herêma Kurdistanê.”

Hêjayî bi bîrxistinê ye ku bi 10’ê salane PDK’ê li Başûrê Kurdistanê li dijî rojnemevanên dengê rastiyê kiryarên nemirovî dike wekî; eşkence, girtin, revandin û kuştin.

# ‘Çareseriya pirsgirêkên Rojhilata Navîn fikrê Netewa Demokratîk e’

Endamê Rêveberiya Kongra Îslama Demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ebdulkerîm Sarûxan diyar kir ku Hêzên hegemonîk Rojhilata Navîn li gorî siyaset û berjewndiyên xwe xwe didin meşandin û çareserî fikrê Netewa Demokratîk e.

**Jîn Hisên/ Qamişlo**

Li Rojhilata Navîn her ku diçe rewş aloztir dibe, pirsgirêkên heyî kurtir dibin û bê çareserî dimînin. Di dema niha de li gelek welatên Rojhilata Navîn şer û pevçûn dewam dikin û roj bi roj qada şer firehtir dibe.

Derbarê geşedanên dawî li Rojhilata Navîn endamê Rêveberiya Kongra Îslama Demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ebdulkerîm Sarûxan ji rojnameya rewş nirxand.



### ‘Ji bo hegemoniya ser gelan ol tê bi kar anîn’

Ebdulkerîm Sarûxan di destpêka axaftina xwe de wiha anî ziman: “Li Rojhilata Navîn du pirsgirêkên sereke hene, pirsgirêka filestîn û Îsrayîl û pirsgirêka kurd bi dagirkerên Kurdistanê re. Ev pirsgirêk jî ya netewperestiyê ye. Di heman demê doza kurdî jî pirsgirêk ne kurd û tirk an ereb û faris e lê ya kurd û netewperstên Tirk, ereb û faris e. Bi gitşê em karin bêjin şerê ku niha tê kirin di navbera ereb û Israîl de netewperestiya Nitinyaho bi artêşa xwe şerê gelê ereb dike û Hemas jî hêz û çalakiyên xwe şerê gelê cihû dike. Nakokiyek kevin û dîrokî heye, çareseriya wê jî tenê di bin navê têgeha Netewa Demokratîk e pêkane ku her du gelên ereb û cihu karibin bi hev re jiyan bikin bi sîstemeke konfedralîzim ku her kes cihê xwe tê de bigre. Bi biryarên netewperestî yên Hemas ku xwe dispêre fikrê ixwanî û cîhadî bi pêkanîna qetlîaman an jî bi şerekî dem dirêj çareserî pêk nayê. Di dîrokê de li Medîne cihû û musilmanan ji xwe re çareserî danîn û bi hev re jiyan kirin, lê îro ev yek nayê pêkanîn ji ber ku dixwazin mijara olî bixin xizmeta siyasetê û bi vî rengî tev digerin.”

### ‘Hêzên hegemonîk cîhanê li gorî siyaseta xwe didin meşandin’

Ebdulkerîm Sarûxan bal kişand ser siyaseta hêzên hegemonîk yên cîhanê û wiha got: “NATO herî zêde ji aliyê DYE tê birêvebirin û Warso jî ji aliyê Rûsya ve tê birêveberin. Herwiha dewletên herêmî ku xwe weke hêz û desthilatdar dibînin, Tirkiyê û Îran e. Di hevpeyaman Sayks Pîko de projeya netewdewlet hat pêşxistin û Rojhilata Navîn êdî parçebûn tê de çêbû, herwiha dewlet hatin damezirandin. Xêzkirina van sînoran nebû çareserî ji bo pirsgirêkên Rojhilata Navîn, tersî wê pirsgirêk kurtir bû û paraçebûna zêdetir çêbû. Yekîtiya Netewan yên hebûn hatin parçrkirin, mîna netewa ereb ku bûn 22 dewlet û her dewletek jî di nava xwe de parçe ye weke mezhebên olî (Sine û Şî`a. Îslama ixwanî ya cîhadî hate çêkirin herwiha islama DAIŞ`ê derket holê. Dewletên ereb li dijî hev êdî xebitîn û bi hevpeymanekê nikarin kar û xebatê bikin, yekîtiya ereban ji hev parçbûye ku di demkê de erban li hev kom dikir. Islama ku ereban pêşengtî jê re dikirin di dema heyî de Îran pêşengtiya wê dike di aliyê Şîaa de û Tirkiyê di aliyê Sine de ji xwe re vê siyasetê didin meşandin. Tirkiyê bi navê ola îslamî erebên Sinî û cîhana erebî li dora xwe kom dike, Îran jî bi hêza xwe û hin dewletên erebî bi nave Şî`a xwe li dora wê kom dikin, ev her du hêz xwe li Rojhilata Navîn dane diyar kirin. Hêzên desthilatdar yên cîhanê li gorî siyasetên xwe van dewletan didin meşandin, dema ku bixwazin jî dibe ku wan ji holê rakirin.”

### ‘Di Rojilata Navîn de du hêzên serdest’

Ebdulkerîm Sarûxan axaftina xwe wiha domand: “Dewletên weke Rûsya û Emerîka yên hegemonîk, bûn sedema avabûna dewletan, di hevpeymana Syks Peko de Kurdistan hate parçekirin, siyaseta ku hate meşandin ji hêla van hêzên hegemonîk ve bû, îro tu çareserî nehat danîn lê kirîzekî pir mezin da jiyan kirin. Îro serdan ji bo dewletên erebî tê kirin ji bo qebûlkirina Israyîlê û guhertinan di Rojhilata Navîn de çêbikin, ji her kesî re xuyaye dewletên ku Israyîl qebûlkirine rewşa welatên wan pir başe û ji nakokiyan dûrin lê welatên ku qebûlnekirin, em dibînin ku her alozî û nakokiyan jiyan dikin. Ji bo ku sîstema xwe bi rê bikin pêşiya Îran di dema heyî de tê girtin, hêza wê li Lubnan û bi Hizbellah re tê hedefgirtin, di Sûriya û Iraqê de jî dixwazin wê bê rol bihêlin, êdî dixwazin di Rojhilatan Navîn de rola wê lawaz bikin. Tirkiyê jî di aloziyek pir mezin de jiyan dike, rola wê jî lawaz dikin tevî ku endama NATO`yê ye lê tevgera wê li gorî Islama radîkal tê dîtin.”

### ‘Kirîzên Rojhialata Navîn berewam in’

Ebdulkerîm Sarûxa wiha got: “Kirîza Rojhilata Navîn wê demeke dirêj berdewam bike, ji ber ku zû çareserî nayê dêtin. Mijarên netewan, ol, dewletan hene û gelek pirsgirêkên din hene, di serî de pirsgirêka kurdî bi van dewletan re û pirsgirêka Israyîl û Filestînê û pirsgirêka Israyîl bi cîhana erebî re, di baweriya min de dem dema netewan e miletê demokratîxwaz, hêza gelan jî heye dema yekbûn hebe. Hêz ne tenê ya dewletan e li Tûnisê dema ku milet rabû karîbûn sîstema dewleta xwe berovajî bikin di heman demê de li Lîbiya, Misirê, Sûriya û Iraq jî hîn kirîz berdewam e û li gelek welatên din. Gel bi hêzin lê ne birêxistinkirî ne bi vî rengî kêmasî derdikevin. Dema gotin şoreşa Buhara Gelan di van welatan de serhildanên gelan çêbû, encam ne li gorî xwesteka gel bû ji ber ku rêxistin tune bû dewlet karîbû zû mudaxele bikin û li gorî xwe serhildan û çalakiyan berovajî kirin, ne hiştin ku bikeve xeta xwe ya rast, ji ber vê gerek em hêza gel biçûk nebînin, dikarin guhertin û veguhertina çêbikin, ev jî bi rêxistinbûyînê pêk tê. Çareseriya van pirsgirêkan li Rojhilata Navîn pergala Netewa Demokratîk e di heman demê de çareserî ye ji pirsgirêkên dewletan jî re ye, gelên demokratîkxwaz karibin weke gelekî azad xwe birêxistin bikin, di hundirê welatên xwe de êdî jiyan bikin rola dewletê lawaz bibe û rola gelê demokras bilind be, di wî alî de wê çareseriyê bi xwe re bîne li beramberî guhertin û veghuertina moderntiya Kapîtalîzimê. Qada Rojhilata Navîn qadeke pir germe ji bo berjewendiyên van hêzên hegemonîk yên cîhanî û heman wextî mudaxeleyên wan yên di Rojhilata Navîn de hatine kirin, her dem ew dixwazin kirîz berdewam be û çareserî çênebe.”

### ‘Çareserî di Rojhilata Navîn de pergala Netewa Demokratîk e’

Ebdulkerîm Sarûxan di dawî de bal kişand ser rêya çareseriyê û axaftina xwe wiha qedand: “Li Filestînê niha nakokiyek heyî di navbera gelê filestîn û israyîlê de ye, ev pirsgirêk ji yên sereke ye li Rojhilata Navîn, lê doza kurdî berî ya filsetînê ye giringiya wê zêdetire. Gelê filsetîn di nava Netewên Yekbûyî tên naskirin û cihê xwe di Meclisa Ewlehî ya cîhanî de girtine, wekî din 22 dewletên erebî nas dike. Em werin aliyê kurd mirov dibîne ku pirsgirêka gelê kurd di asta cîhanî nayê naskirin, herwiha erdnîgarî, ziman, dîrok û çanda vî gelî nas nakin. Pirsgirêka gelê kurd weke pirsgirêka dewletan yên navxweyî didin diyar kirin, di Tirkiyê de weke pirsgirêkek navxweyî nîşan didin di heman demê de li Sûriya, Iraq û Îran. Di rastî de doza gelê kurd pirsgirêkek navnetewî ye, hêzên sermayedar dihêlin ku ev pirsgirêk di dema heyî de bê domandin û bê çareserî bimîne. Ji bo ku Tirkiyeke nû bidin ava kirin di salên 1920`an de dema hevpeymana Syks Peko û Lozanê gelê kurd kirin qurbanî, di heman demê de Sûriya û Iraq û Îran ji bo wê îro pirsgirêka sereke li Rojhilata Navîn doza kurdî ye paşê ya Filestînê ye. Çareseriya van pirsgirêkan rengê Netewa Demokratîke an jî sîstema konfedralîzimê ku were dameziran-din, konfedalîzma Rojhilata Navîn çêbibe hemû gel weke nasnameya xwe jiyan bikin bi hev re itîfaq bikin mîna ku di dîrokê de berî ku dewlet çêbibin. Ji ber avabûna netewdewletan ku berjewendiyê xwe didin asta yekemîn çareserî wê zehmet be ku bê pêkanîn, gelan dikin qurbanî ji bo sîstema netewdewletan, ji ber vê yekê rengê konfederalîzim û netewa demokratîk pêkan e.”

# Dagirkeriya Tirk û şerxwazî?

**Volqan Elî**

Rast e, dagirkeriya Tirk şerxwaz e. Her kes jî vê dizane. Ew bi xwe jî înkar nake. Mînak, niha hêza yekemîn ku dilê wê ji bo ku di navbera Îran-Îsraîl de şer biqewime lê dide, dagirkeriya Tirk e. Ji bo mirov vê bizane ne hewce ye mirov siyasetmedar, yan jî lêkolîner be.

Dîsa dema ku di 2011’an de Sûriyê de tevlîhevî dest pê kir, hêza ku piştgirî da çete û hemû hêzên biyanî Tirkiye bû. Ev helwesta xwe heya dawiyê hîn didomîne. Di halê hazir de bajar û herêmên giring ên Sûriyeyê di bin destê vê hêza dagir de ne. Wekî vê, piştî ku hêzên emperyalîst dest werdana li Lîbyayê kirin, dagirkeriya Tirk li gorî xwe li vê derê jî dest werda. Bi heman awayî dest werda li şerê Ermenistan û Azerbêcanê jî.

Di destpêka sala 2024’an de li Îranê komkujiyeke mezin hate kirin. Her çendî DAIŞ’ê girte li ser xwe jî. Hin daneyên heyî û ketine çapemeniya giştî, dest nîşanî dagirkeriya Tirk kirin. Çend mehan berê serokê komarê Îranê, helîkoptera wî ket û ji ber vê yekê jiyana xwe ji dest da. Rast e ku ti daneyên vê bûyerê bi Tirkiyeyê re girêdidin ên bi hêz tine. Lê divê mirov qet ti car vê jî paşguh neke ku dagirkeriya Tirk timî dixwaze bi Îraneke lewaz û dorpêç kirî ve bibe muxatab.

Di vê helwesta dagirkeriya Tirk de du armancên sereke hene. Ya yekê dixwaze bibe hêzeke serwer û hegemonîk a herêmê. Ya duyemîn jî dixwaze Kurdan qir bike, di jenosîtê re derbas bike. Niha dibe ku me gotibe, armanca yekemîn û duyemîn, lê ev her du jî hema bêje yek hedef in, bi hev re kelijîne. Rewş wisa ye; yanî dewleta dagirker a Tirk dizane ku eger nebe hêzeke xwedî gotin û serwer li herêmê nikare Kurdan qir bike. Lê belê çi dike? Ji bo ku armanca xwe ya ku dixwaze welatên li derdorê dagir bike veşêre, dibêje “ez dixwazim bikevim li Sûrî û Kurdan tine bikim, ez dixwazim bikevim Başûr Kurdan tine bikim”. Jixwe nabêje ‘Kurd’, navê me jî nayîne ser ziman. Ji ber ku Kurd qet tine (!) dibêje, “terorîst, korîdora terorê”, û ji bo Bakûr û Rojhilatê Sûriyeyê jî dibêje “terorîstan, ez ê biçim li wê derê terorîstanê rakim”. Çima wisa dibêje? Ji ber ku bêje “ez ê Kurdan tine bikim”, dibe ku gelên herêmê bêjin, “çima tu dixwazî Kurdan qir bikî, ma çavê te li welatê wan e? Eger wisa be, tu ji bo me jî xeter î”. Ji ber vê yekê nabêje ez ê Kurdan tine bikim”. Ya din jî ji bo ku hêzeke destek ji xwe re peyda bike, bide pêşiya xwe bi ser Kurdan de biçe, dagirkeriya xwe rewa bike li Başûr Mala Barzanî ji xwe re dike destik. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi ENKS’ê re têkiliyan bi pêş dixe, li Enqerê radizîne. Li Efrînê navêndên Barzanî dide vekirin.

Wekî di mînakan de jî xuya ye, her du armancên dagirkeriya Tirk di nav hev de ne. Yanî, ew jî dizane eger nikaribe Kurdan tine bike, nikare li herêmê bibe hêzeke serwer; nikare welatê Ereban dagir bike û biçe li Şamê nimêj bike. Dîsa nikare li ser serê Erebên Îraqê hikma xwe bimeşîne. Lê çi dike? Durûtî û derewan dike û dibêje “ez ê terorîstan tine bikim”. Bi sedan debabe û erebeyên zirxî dixe erdên Başûr. Ji aliyê din ve hêza ku terorîstên DAIŞ’î ji Sûriyeyê dibe erdên Başûr jî ew bi xwe ye. Bi ava Firat û Dîcleyê gefan li Îraqê dixwe, şantaj dike.

Lê belê pêşketinên dawî (15.08.2024) û bi taybet jî yên li Îraqê nîşan didin ku rejîma Îraqê ev xetereya li ser gelê Êreb û Kurd nedîtiye. Berevajî, benê xwe bi destê xayinekî wekî Fuad Hisên ve berdaye. Temam, ya ku çûbû li Tirkiyeyê ew peymana teslîmkirina erdên Îraqê mor kiribû ekîba hikumeta dewleta îraqê bû lê ev peyman bi temamî di berjewendiya xiyanetkariya Mala Barzanî de ye. Nexwe ti berjewendiya gelê Kurd û Ereb tê de tine ye.

Dewleta Îraq yan jî Sûriyeyê bi tawîzan nikare pêşî li dagirkeriya Tirk bigire. Dewleteke wekî Îraqê eger nikaribe serweriya xwe li ber dagirkeriya Tirk biparêze, sibe-du sibe faşîzma Tirk wekî li ser gelên Sûriyeyê qut kiriye dikare dîsa avê qut bike. Temînata vê ti kes nikare bide. Ya din jî serweriya welatekî ji her tiştî girîngtir e; bi taybetî li pêşberê hêzeke wekî dagirkeriya Tirk.



# ‘PDK’ê ji dîroka Kurdistanê re rûpelek reş dinivîse’

Ji destpêka avabûna PDK’ê ve û heta niha, ew li dijî hebûn û azadiya gelê kurd ji dijmin re bûye dûvik. Ji bo parastina berjewendiyên xwe wê tu carî dest ji xeta xiyanetê bernedaye û li dijî tevgerên kurd yên azadîxwaz şer kiriye.

**Zana Roj/ Şehba**

Di van demên dawiyê de careke din di berdewamkirina siyaseta hevkariya bi dagirkeriya Tirkiyê re, PDK ê di nava lihevkirinên nû bi faşîzma Tirkiyê re ye. di nava van lihevkirin û nêzîkatiyan de; hedefgirtina Tevgera Azadiyê di Çiyayên Kudistanê de ye. Têkildarî vê yekê endama Meclîsa Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD’e li Kantona Efrîn û Şehbayê Sûreye Mistefa ji rojnameya me re axivî.

### `Birêveirina Başûrê Kurdistanê ji aliyê PDK ê ve; şeklî ye`

Sûriye axaftina xwe wiha destpê kir: “Malbata Berezanî bi riya PDK’ê di hundir Başûrê Kurdistanê de weke hikumeteke şeklî li ser serweriya herêmê maye. Bi avakirina vê statutê re û heyanî niha ji bo serketina doza azadiya gelê Kurd li çar perçeyên Kurdistanê tiştek pêş nexist, li hember wê hevkarî bi dijminê gelê Kurd yê sedsalî re dike. Berzanî di serweriya xwe de tenê malbatî fikirandin û parastina berjewendiyên xwe li ser hesabê gelê Kurd dide meşandin. Ev yek li hember tavahî gelê Kurd dibe xiyaneta herî mezin. Îro tavahî gelê Kurd di wê ferqê de ye ku PDK ê ji bo yekrêziya Kurdî û avakirina Kurdistaneke serbixwe tu gav neavêtin, jê xiraptir rê li hember perçekirin û destwerdanên faşîzma Tirkiyê ji bo Başûrê Kurdistanê, Bakur û Rojhilatê Sûriyê vedike.”



### `Armanca PDK’ê hedefgirtina Gerîlayên Azadiyê ye`

Sûreye diyar kir ku hevkariya PDK ê bi dagirkeriya Tirkiyê re ji bo tunekirina Tevgera Azdiyê ye û wiha pê de çû: “PDK ê her çiqas li hember Tevgera Azadiya Kurdistan bi veşartî sekinî be û hedef girtiye. Lê tevgera Apoyî ya ku zêdetirî 50 salî ye têkoşîna azadiyê di çiyayên Kurdistanê de dide meşandin bi destê PDK ê niha tê hedefgirtin û pilanên mezin bi dagirkeriya Tirkiyê re dide rêzkirin. Hevkariya PDK ê ji dîrokê de bi dagirkeirya Tirkiyê re di asta yekemîn de ji bo tunekirina Tevgera Azadiya Kurdistan û Gerîlayên wê di herêmên Parastinê yên Medyayê de ye. PDK ê tu carî felsefeya Rêber Abdullah Ocalan ya demokrasiyê, Gerîlayên Azadiyê û Pirojeya Netewa Demokratîk li ser rûyê erdê qebûl nekiriye. Ev neqebûlkirin armanca yekemîn ya PDK ê bi dagirkeriya Tirkiyê re misoger dike.

Di demên dawiyê de êrîşên gelek dijwar li ser Qadên Parastinê yên Medyayê tên kirin. Ev êrîş bi hevkariya PDK ê bi Tirkiyê re tên kirin. PDK ê di Başûrê Kurdistanê de rê li ber derbasbûn û rihetbûna êrîşên dagirkeriya Tirkiyê li ser Gerîlayan bi hemû teknîk û çekên qedexekirî pêk tîne; vedike”.




### `Tevgera Azadiyê di xeta têkoşîna azadiyê de berdewam e`

Sûreye di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Tevgera Azadiya Kurdistan di xeta xwe ya têkoşînê de gelek zelal e, PDK ê di nava dîrokê de her hewildaye şerê birakujiyê di navbera hêzên Kurdî de û bi tayebet bi Tevgera Azadiyê re bike. Lê Felsefeya ku ev tevger li ser hatiye avakirin û şer dike, rê li hember şerê birakujiyê venake û ev yek bi tu awayî nehatiye hilbijartin. Gerîla di Başûrê Kurdistanê de bi şerê ku dide meşandin, hewla li pêşiya mudexelekirina faşîzma Tirkiyê di Başûrê Kurdistanê de digire û ev yek li xweşiya PDK ê nayê. PDK ê di xetên xwe yên xiyanetê de di Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di herêmên dagirkirî û her wiha di siyaseta Başûr de ji bo parastina hebûn û berjewendiyên xwe pêşxistina şerê birakujiyê, destek û hevkarî bi faşîzma Tirkiyê re bi zelalî kiriye”.

### `Wê tu armancên Partiyên sexte di Kurdistanê de pêk neyên`

Sûreye di dawiya axaftina xwe de anî ziman ku wê tu bilan û biryarên partiyên sexte di Kurdistanê de bi ser nekeve û wiha got: “Armanca partiyên sexte yên ku xwe li ser xwîna şehîdan di Kuridstanê de mayînde kirine, perçekirin û parastina berjewendiyên xwe ne. Lê biryara gelê Kurd ya ku di oxira têkoşînkirina di doza azadiya Kurdistanê de bi hezaran bedel dane; ew e ku tu pilan û siyasetên wan partiyan li ser gelê Kurd biser nekevin e. Di serdema heyî de û di nexşeya Rojhilata Navîn ya nû de wê gelê Kurd, Kurdê xwedî îrade, çand û zimanê xwe wê hebin û emê nebin peçeyek ji pilan û hesabên dagirkeran û van partiyan”.

## Yên ku di înkar û pişaftinê de hevkariyê dikin



**Zekî Bedran**

Li Sûriyê demek nêz de hilbijartinên parlementoyê çêbûn. Ev hilbijartin ji çavdêriyê saziyên Navnetewî re vekirî nîn bûn. Hilbijartin çawa çêbûn, rêjeya gel ya ku çûne li ser sandoqan kes nizane. Pir eşkereye ku ev hilbijartin ne zelal bûn û di vê hilbijartinê de hevrikeyekê demokratîk nebû. Armanca bingehîn ya vê hilbijartinê rewakirina desthilatdariya otorîter ya Baasê ye. Di vê hilbijartinê de rêxistinên cûda di şert û mercên wekhev de armanc û bernameyên xwe pêşkêşî gel nekirin û pêşbirkeke wekhev nebû. Lê belê di Sûriyê de hemû ragihandin û çapemenî di destê desthilatdariyê de ye û yê ku li ser hemû derfetên dewletê xwediyê mafe, yek partî ye.

Di welatekî wek Sûriyê de azadî xeyalkirin, bi hêvî pêşerojê nêrîn û jîyaneke ku were jiyîn avakirin gelek dûrê jiyana mirova ye. Dewlet wek sazûman ku bikeve di bin xizmeta gel derdikeve û dizîvire sazûmanekî çors ya ku gel di bin xizmeta wê de ye û girêdayê wê ye. Dewlemendiyên welat dê çawa were bi karanîn, gel dê çawa bijî û perwerdeyeke çawa bibîne ên ku dewletê bi rêve dibin biryara vê didin. Ên ku dewletê rêve dibin jî gelemperî beşeke teng û olîgarşîk in. Ji ber vê yekê gel ketîye di bin xizmeta beşeke teng ya olîgarşîk û em dikarin bibêjin ku wek xulamên modern di bin pergala dewletê de kar dikin. Li vê derê armanc û xwesteka gel ya xwe rêvebirinê, vîna gel, û li ser biryaran bandora wê nîne. Welatê Sûriyê hilweşiyaye û ji bo ku ji vê rewşê derkeve û birînên xwe bipêçe teqez guhartina hişmendiya wê pêkan e. Ger ku ronakbîrî û demokratîkbuyînek nebe, ne misogere ku gelên Sûri wekhev û azad bijîn û bibin xwediyê îradeyê. Dixwazin gel bikaranîna ol ve an jî gurkirina netewperestîyê û nakokiyên çînî ve, bi derewan ve ango demogojiyê ve, neheqî û dizîyên berhemên welat veşêrin û hikûmeta girêdayê derewan ava bikin.

2011’an vir ve di pêşengtiya dewletên wek Tirkiyê Sûriyê kişandine aloziyek bi xwîn. Tevlîhevîyeke bêhempa hate jîyankirin. Ji nîv milyonê zêdetir mirov hatin kuştin. Tê gotin ku nêzî 10 milyon însan jî ji cihên xwe derbeder bûn, di nav welat û derveyê welat de ketin rewşa koçberiyê. Welat bi dîtbarî buye çar perçe. Xeteriya herî mezin jî li Tirkiyê tê. Tirkiye dixwaze cihê ku dagir kiriye berfireh bike. Bi vê ve jî sînordar namîne, bi demografîya wê ve jî dilîze. Taybet cihên Kurd lê mişext kirine Ereban, çeteyên devşirme û malbatên wan dixwaze bi cîh bike û bi vê awayê dixwaze Rojava bi tevahî ji holê rake.

Divê hikûmeta Şamê di serî de Kurdan û bi rengekî taybet gelên ku li herêmê jiyan dike hembêz bike, yekîtiya xwe ava bike û bi vê awayê ji bo dawîanîna dagirkeriya Tirk xebatan bike. Lê wisa nabe. berûvajî, ew jî ji holê rakirina heremên xweser, dawîkirina mafên Kurdan ên demokratîk û çandî dixwaze û bi vê awayê deshilatdariyeke teqez armanc dike. Ango wek encam bişaftina Kurdan pêk bîne û komkujîyê re derbas bike. Di vê bingehê de armanca dewleta Tirk û hikûmeta Şamê ya holê rakirin û tinekirina Kurdan ji dîrokê ve derdikeve holê.

Ji ber vê divê hemû gelên Sûri û bi taybet gelê Kurd jî vê rastiyê bizanibe û ji bo wê têkoşîna xwe ya hebûnê bi awayekî berfireh û bi hêz bimeşîne. Taybet divê gelên cîhanê herdem agahdar bike û di bin gefên çawa de ye bide fêmkirin. Dewleta Tirk lihevkirinê bi Kurdan re naxwaze. Ji xwe di Sûri de Kurdan bi Tirkiyê re tu şerek jî îlan nekirî ye û herêmeke wan jî dagir nekirî ye. Li dijî DAIŞ’ê bi Koalîsyonê re jî hevkarî kirî ye, Bakûr û Rojhilatê Sûri azad kirî ye, xwe rêxistin kirî ye û ewlekariya xwe pêk anî ye. Îro hem ji bo Sûri hem jî ji bo Rojhilata Navîn pirçandinî, pirzimanî û hikûmeta gelan ya wekhev û azad derxistiye holê. Cihê ku vêya biparêze û berfirehtir bike zêdetir Dewleta Tirk dixwaze bi israr gelê Kurd biperçiqîne, ji holê rake û li ser ruyê erdê biqedîne. Bi heman awayê hikûmeta Şamê jî vê modêla demokratîk ji bo xwe wek pergalekê ne baş û xeterîyekê dibîne.

Hikumeta xweser li ser bingeha yekîtiya Sûrî de ji bo ku bi hikumeta Şamê re li hev bike û Sûriya demokratîk ava bike bi israr lêgerînên xwe ên çareserîyê didomîne. Lê heta roja îro jî gav avêtineke hikûmeta Şamê ya erênî çênebûye. Şagirtên ku li Herêmên xweser perwerde dibînin, dîplomayên wan ji alîyê hukumeta Sûri ve nayê pejirandin. Ango sedhezaran zarok wek perwerde nedîtine tên pejirandin. Lê ev hemwelatiyên Sûrî ne û di Sûrî de jiyan dikin. Ji bo pejirandina şehadên wan guhartineke qanûnî jî pêwîst nake. Parvekirina nivîsekî fermî ya wezareta eleqedar bese. Lê belê Hikûmeta Sûrî naxwaze hebûna Kurdan, fermî kirina ziman û çanda wan nas bike. Di cewhera xwe de înkar û bişaftin heye. Pirsgirêk nakokîya Herêmên Xweser an jî xwestekên zêde yên gelê Kurd nîne. berovajî wê, mafên wan ên herî xwezayî ji aliyê hukumetê ve nayê pejirandin. Sûriyê di sala 2011’an de çawa dihate rêvebirin dîsa li pey lêgerîn û avakirina wê ne. Di vê bingehê de gel, ronakbîr, ên ku tekoşîna demokrasiyê didin li dijî hêzên mêtinger û dagirker divê yekîtiya xwe xurt bikin.

## Li Bexda û Hewlêrê tevna qirêj



**Farûk Sakik**

Hetanî bihara gelan, li Rojhilata Navîn dewletên ku hebûn her çiqas fizikî ser bi xwe bûn, lê her dîktatorê wê dewletê ji derve ve bi hêzekî ve girêdayî bû. Dewletên wek Sûrî û Iraq li hemberî Tirkiyê xwedî qûdreteke mezin bûn. Dewleta Tirk nikarîbû midaxleyê van dewletan bike.

Bi destpêka Şerê Sêyemîn ê Cîhanê hemû hevsengî hatin guhertin. Tirkiyê jî dixwest ji vê yeke sûdê wergire.

Ev demekî dirêj e dewleta Tirk li Rojhilata Navîn dest bi liv û tevgerek dîplomasiyê kiriye. Ev hevdîtin û trafîka dîplomasiyê, hemû bi tenê li ser esasê tinekirina gelê Kurd û Tevgera Azadiyê nîne. Hin armancên wî hene û ev tevger li pêşiya wan asteng e. Ji bo bigihîje van armancên xwe, divê rê were paqijkirin.

Li Rojhilata Navîn çi dibe? Çi diqewime? zelal nîne. Ji daxwaza dagirkirina herêmek cûdatir, dixwazin ji aliyê Abûrî, berjewendî, şîrket, aborî ve bibe xwedî insiyatîf. Mînak dewleta Tirk dixwaze di vî şerî de ‘avê’ wek çekekê bi kar bîne.

Dema ku em li nirxandinên pisporên stratejiyên Rojhilata Navîn dinêrin, her yek li gorî xwe diaxive û 2 roj şûnde jî ev nirxandinên wan vala derdikevin.

Bi tenê em li tevgera Amerîka ya ku li vê herêmê binêrin. Wezîrê Karê Derve yê Amerîka Antony Blînken, ji 7’ê Cotmeha 2023’an heta îro 9 car e çû Îsraîlê. Ev serdanên wî dide xuyakirin ku liv û tevgereke çawa heye.

Dewleta Tirk a dagirker ev dît û ji bo vê yekê wan jî di destpêka sala 2024’an ve siyaseteke nû dane destpêkirin. Ji bo vê jî Bexda û Hewlêrê kir navenda stratejiya xwe.

Ji serê salê ve rayedarên dewleta Tirk bi dehan car serdana Iraq û Hewlêrê kirin. Her roj şandeyek serdana Iraq û Hewlêrê dikirin. Di encama hevdîtinan de, bi Iraq û Hewlêrê re hin peyman hatin îmzekirin.

Di encama hevdîtinan de, dewleta Tirk dest bi operasyon û êrişên berfireh kir. Dewleta Tirk Duhokê weke xaka xwe da nasandin û dest bi kontrolkirina nasnameyan kir. Kontrolkirina nasnameya wisa kiryarek ji rêzê nîne. Her tişt bi vê kontrola nasnameyan tê îzahkirin. Dagirkerî ev e.

Di 15’ê Tebaxê de her du alî Iraq-Tirkiye hatin cem hev. Di vê hevdîtinê de ‘Peymana Çarçova Stratejîk’ û odeya plansaziya hevpar hat eşkerekirin. Li Enqere û Bexdayê jî odeyên şerê dijî Tevgera Azadiya Kurdistanê tên avakirin.

Li gorî lihevkirinê, wê baregeha leşkerî ya Tirkiyê ya li Beşîkayê, radestî hêzên Iraqê were kirin. Di destpêkê de dema ku mirov lê dinêre dibêje, aha wa Tirkiye ji Başîka vedikişe. Na, nû bi cîh dibe.

Di van odeyên şer de, wê rayedarên ji wezîrên karên derve yên Iraqê, Tirkiye, wezîrên parastinê û serokên rêxistinên îstîxbaratê amade bin. Başîka jî yek ji van navendan yek e. Her çiqas di fermiyetê de radestî Bexdayê hatibe kirin jî, li wê derê îstîxbarat û hêzên Tirkiyê wê hebin.

Li gorî peymana hatî lihevkirin, Beşîka baregehek perwerdehiyê ye. Kî wê perwerde bibe? Çeteyên di bin kontrola Tirkiyê de ne(DAIŞ jî di nav wan de) li wê derê birêxistin bikin û li dijî Kurdan bidin şer kirin. Berê jî heman baregeh li dijî Kurdan û Tevgera Azadiyê dihat bikaranîn. Hikûmeta Iraqê jî dem bi dem di daxuyaniyan de ji Tirkiyê dixwest ku vê baregehê terk bike. Lê piştî ku PDK’ê di hevkariya xwe ya bi Tirkiyê re israr kir, Bexda (serokwezîrê Iraqê Mihemed Şiya Sûdanî) ji bo desthilata xwe û ji bo hilbijartinên 2025’an, di 22’yê Nîsana 2024’an de bi Erdogan re hevdîtin pêk anî.

Herî dawî PDK’ê li lîsta dijminên Kurdan hikûmeta Bexdayê jî zêde kir.